# Birwanama Xewndigeha Bala (HSC) asta herî kêm

## Agahdarî ji bo dêûbav û lênêran

Dê û bavên delal

Pêşkêş kirina Birwanama Xewndigeha Bala (HSC) asta herî kêm ji hêla Desthilatdariya Standardên Perwerdehiya NSW (NSW Education Standards Authority (NESA)) ve tê vê wateyê ku xwendekarên li NSW hewce ne ku Astek herî kêm a xwendin û hejmartinê nîşan bidin da ku belga Birwanama Xewndigeha Bala (HSC) werbigrin.

Xwendekar dê îmtihatên ên asta herî kêm ên HSC-ê di sê warên xwendin, nivîsandin û hejmartinê de rûnin. Her imtihanê serhêl 45 deqîqa dirêj e û bi vî rengî tête saz kirin:

- îmtîhanek pir-bijartî ji bo xwendinê;
- îmtîhanek pir-bijartî ji bo hejmartinê; û
- îmtîhanek ji bo nivîsandinê (heta 500 peyvan) li ser bingeha daxwazek nivîskî an dîtbarî.

Pêdivî ye ku xwendekar di her sê qadên îmtîhanê de Asta 3 an 4-an bi dest bixin da ku standarda herî kêm HSC bi dest bixin. Ev tê vê wateyê ku xwendekarên ku astek nîşan didin xwedan jêhatîbûnên bingehîn ên kirdarî in ku di jiyana rojane de, ji bo kar û xwendina bêtir têne bikar anîn.

Xwendekar her sal gelek fersend hene ku li van îmtîhanên serhêl bidin, ji Sala 10-an heya dawiya Sala 12-an de. Di navbera dubare-hewldan her îmtîhan de demên bendewariyê hene.

Dê xwendekar ji hêla dibistanê ve werin piştgirî kirin ku asta herî kêm HSC bicîh bînin. Li ser malpera NESA îmtîhanên ezmûnê hene ku li dibistanê û pirsên xwenîşandanê serhêl hene: https://educationstandards.nsw.edu.au/wps/portal/nesa/11-12/hsc/hsc-minimum-standard/online-tests

Heke hûn bêtir agahdarî dixwazin, ji kerema xwe bi dibistanê re têkilî daynin.

Heke hûn bawer dikin ku zarokê we hewcedariyên zêde hene û dê ji bo îmtîhan ên asta herî kêm HSC ji bo tedbîrên zêde guncan be, ji kerema xwe bi kesê pêwendiya dibistanê re ku li jêr tê xuyang kirin telefon bikin:

Navê kesê pêwendiya dibistanê

Hejmara têlefonê ya kesê pêwendiya dibistanê

Li gel rêzê

Mûdîr

Navê dibistanê

### Xizmeta Wergêra Telefonê

Heger pêdiviya we bi tercumanek hebe ku ji we re bibe alîkar ku hûn bi dibistanê re têkilî daynin, ji kerema xwe telefonî Servîsa Wergêra Têlefonê li ser 131 450 bikin û wergêrek bi zimanê xwe bixwazin. Ji operatorê re jimara têlefonê ya ku hûn dixwazin têlefonê bikin bibêjin û operator dê wergêrek li ser xetê bistîne da ku di axaftinê de alîkariya we bike. Hûn ê ji bo vê xizmetê dirav nadin.